Ronahî
şopdara rastiyê ye
Hejmar :416 nameronahi@gmail.com 19- Tîrmeh - 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

# Zarokên bedew ên li zozanan



Zarokên ku bi biharê re tevî malbatên xwe diçin zozanan, li ber Reşmalan dilîzin û zozanên rengîn hîn bêhtir dixemilînin.
Bi biharê re welatî tevî pezê xwe berê xwe didin zozanan. Zarok jî li ker, hêstir û hespan siwar dibin û tevî malbatên xwe berê xwe didin zozanên Goşinê, Kêlaşîn, Xinêrê û Lolanê.
Dibe ku hinek ji wan zarokan li zozanan ji dayik bûne. Hinek jî li bajar û gundan. Rêwîtiya ber bi zozanan ve ji bo zarokan cihê kêf û şahiyê ye.
Zarok kom bi kom li ber Reşmalan ji xwe re dilîzin. Zarokên hatine zozanan ji xwe re heval jî peyda kirine. Berx û karik ji bo zarokên li zozanan bûne heval.

## JIYANA XWEZAYÎ JI BO WAN DIBISTAN E

Zarokên derdikevin zozanan ji dibistan û mamosteyên xwe qut dibin. Lê belê ew li nava xwezayê û jiyana xwezayî dest bi 'dibistana zozanan' dikin. Dibistana jiyana xwezayî ku ew lê dixwînin bi destê her kesî nakeve. Rûyê wan timî li ken e. Mirov li ser rûyê wan ê li ken û çavên wan ên bedew cîhana xweşik dibînin.
Bi kêf û xweşiyeke mezin, ber destê sibehê jiyanê pêşwazî dikin. Lê belê yên ku vê jiyana bedew diherimînin nasekinin.
Ji ber bomberdûmana balafirên şer ên Tirk û liv û tevgera wan a li herêmê, zarok timî bi tirs in. Her ku dengê balafirê tê yekser dibezin cem dê û bavê xwe.

## LÎSTIKÊN WAN JI HERIYÊ NE

Zarok her sibehê tevî dê û bavê xwe ji xewê radibin. Carna bi dawa dayika xwe digirin û li pey wan digirîn. Carna jî bi şelwerê bavê xwe digirin û pê re diçin çêrandina heywanan. Her wiha şivantiyê ji berx, karik, qaz û mirîşkan re jî dikin. Di dema bêriyê de tevî dayika xwe diçin bêriyê. Hewl didin li ber heywanan bin. Çêkirina xanî ji kevir û heriyê, lîstika wan e...*ANF*

# Pêngava aşîkirina zarokan didome

Komîteya Tenduristiyê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê pêngava duyemîn a hemleya aşîkirina zarokan da destpêkirin.
Komîteya Tenduristiyê ya Meclisa Sivîl a Reqayê ji bo ku zarok bi nexweşiyên sorik û felicê nekevin pêngava aşîkirinê dabû destpêkirin. Komîteyê pêngava duyemîn a hemleyê da destpêkirin.
Di çarçoveya hemleyê de, tîmên aşîkirinê ku hejmara wan 30 tîm in, li gelek navendên tenduristiyê yên ku ji aliyê komîteyê ve hatine vekirin zarokên ji temenê 7 meh heta 6 salan aşîkirin.
Serokê Komîteya Tenduristiyê ya Meclîsa Sivîl a Reqayê Ehmed Îsamîl diyar kir ku armanca pêngavê parastina tenduristiya zarokan e û her wiha piştî hejmarek zarok bi nexweşiya sorikê miri bûn pêngav dane destpêkirin.
Ehmed anî ziman ku wê pêngva aşîkirinê berdewam bikin. Tê payîn ku pêngav heta 26 vê mehê bidome.



# Hêza bakurê Sûriyê mezin dibe



109 ciwan piştî ku ji Akademiya Şehîd Zekeriya û Akademiya Şehîd Jînda yên QSD'ê mezûn bûn, tevlî refên QSD'ê bûn.
Li gorî malpera QSD'ê;
Li Akademiya Şehîd Zekeriya û Akademiya Şehîd Jînda yên girêdayî QSD'ê bi tevalîbûna 109 ciwanan dewreyên perwerdeyê bi navê "Şehîd Şîlan Efrîn" û "Şehîd Ciwan Heleb" hatibû vekirin.
Dewreyên perweredeyê piştî 3 mehan bi merasîmeke bi dawî bû. Bi dehan şervan û fermandarên QSD'ê di merasîmê de amade bûn.
Di perwerdeyê de li ser mijarên cihê reng yên fikrî û hunera şer ders hatin hatin dayîn
Di merasîma leşkerî de, Ji fermandarên QSD'ê Mazlûm Kobanê qedandina dewreyê pîroz kir û spasiya rêveberên perwerdeyê kir. Kobanê hêvî kir ku şervan erka xwe ya li hemberî welat pêk bînin.
Di dawiya merasîmê de şervanan sonda xwarin û dest bi erka xwe kirin... *ANHA*


# Agirê Çiyayê Gabarê nayê vemirandin

Li Herêma Çiyayê Gabarê ya Şirnexê piştî leşkeran hawan û top ji qereqolê avêtin qada daristanî, agir bi daristanê ket.
Li herêma Çiyayê Gabarê ku di navbera Cizîr û Şirnexê de ye, piştî leşkeran ji qereqolê top û hawan avêtin qada daristanê, li qada daristanê şewat derket. Çavkaniyên herêmî diyar kirin ku piştî li qada daristanê şewat derket, şewata daristanê didome û belav dibe. Welatiyan anîn ziman ku şewata daristanê li qadek fireh belav bûye û kes mudaxale nake.



Ronahî
şopdara rastiyê ye
nameronahi@gmail.com Hejmar : 416 19 - Tîrmeh- 2018 Rojnameya Siyasî û Çandî

## Hêzên gerîla li artêşa Tirk a dagirker dan



Gêrîla bi çalakiyên mezin derbên giran li artêşa Tirk dixin. Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir hêzên gêrîla di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de li Mêrdîn, Amed û Bedlîsê çalakî hatine lidarxistine. Li gorî daxuyaniya HPG'ê li navçeya Farqîn a Amedê '2 kontra' hatin kuştin.*R-2*

# SALVEGERA ŞOREŞA AZADIYÊ PÎROZ BE



## ŞOREŞ JI BO GELAN BUYE CIHÊ MORALÊ

19'ê Tîrmeh'ê 2012'an çirûskên agirê Şoreşa Rojava li Kobanê hat pêxistin. Ev agirê şoreşê pêl bi pêl li hemû Rojava belav bû. Gelê Kurd li parçeyê herî piçûk yê Kurdistanê Şoreşa Azadiyê pêk anîn. Şoreşa Rojava bi berdelên mezin hat parastin û ji bo hemû gelên bindest yên cîhanê bû cihê hêz û moralê. Ev şoreş îro buye bingeha demokratîkbûna Sûriyê.

## ŞOREŞA ROJAVA BÛYE MÎNAK

Bi rasthatina salvegera şeşemîn ya Şoreşa 19'ê Tîrmehê li her deverê pîrozbahî tên lidarxistin. TEV-DEM'ê, KNK'ê, KCK'ê, YPJ'ê, KCD'ê peyamên pîrozbahiyê weşandin. Di peyaman de wiha hat gotin, "Şoreşa Rojava bi demokratîk bûna xwe ji bo hemû cîhanê buye mînak. Şoreşa Rojava bi xeta xweseriya demokratîk û konfederalîzmê bûye modela azadî û demokrasiyê."

## Dayika ku sê zarokên xwe diyarî şoreşê kiriye



Dayîka Cemîla Nûhê ya ji Til Teltemirê sê zarokên xwe diyarî şoreşa Rojava kiriye û her sê zarokên wî yên bi navê Mazlûm, Hogir û Şehreman di ber şoreşê de canê xwe feda kirine û şehîd bûne. Dayîka Cemîleyê wiha got, "3 zarokên min ji bo axa xwe û rûmeta xwe biparêzin li dijî dijmin re şer kirin û şehîd ketin." *R-3*

## Sedema aloziya Sûriyê navendîbûne



Foruma Danûstandinê ya Sûrî-Sûrî li navçeya Eyn Îsa ya kantona Girê Spî bi beşdariya hejmareke zêde ji kesayetên siyasî û muxalîfên ji gelek herêmên Sûriyê bi dirûşmeya "Danûstandina Sûrî-Sûrî hevdîtina avaker e" pêk hat. Di Forumê de Foza Yusif axivî û got, "Netewe dewleta a ku li ser înkara gelan hatiye avakirin bû sedema aloziya ku niha li herêmê pêk tê." *R-2*

## 19'ê Tîrmehê bendên koletiyê şikand



Hevseroka Kantona Hesekê Semer Ebdullah derbarê Şoreşa Rojava de axivî û diyar kir ku Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye û wiha got, "Şoreşa Rojava di pêşengtiya jina Kurd de mohra xwe li serkeftinek mezin xist. Di her qadên jiyanê de pêşketinên mezin pêk hatin. Di 19'ê Tîrmehê de bendên koletî û desthilatdariyê hatin şikandin." *R-3*

## Li Efrînê yek ziman, yek mezheb tê ferzkirin



Civata gelên gef li wan tê xwarin (GfbV) ku navenda wê li bajarê Gottîngen ê Elmanyayê ye, rapora xwe ya li ser Kantona Efrînê ku 4 meh in ji aliyê leşker û çeteyên Tirk ve hatiye dagirkirin, weşand. Saziyê destnîşan kir ku yek ziman û yek mezheb li ser gelê herêmê tê ferzkirin. *R-5*

## Xezeba Zeytûnê Tola Efrînê hiltîne

Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir şervanên wan li herêma Etmê ya Îdlibê li çeteyên dewleta Tirk dan. Di çalakiyê de 5 çeteyên Feyleq El Şam hatin kuştin. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Em tekez dikin ku her kesê ku destê wan di dagirkirina Efrînê de heye, wê hesabên mezin ji wan were xwestin." *R-2*



## Şoreşa 19'ê Tîrmehê bingeha Sûriya Demokratîk e



Hevserokê Meclîsa Qanûnsaz li Kantona Efrînê Mihemed Seîd Yûsiv salvegera şoreşa 19'ê Tîrmehê nirxand û diyar kir ku wê bi rihê şoraşa Rojava Efrîn were rizgar kirin. Yûsiv wiha got, "Şoreşa 19 Tîrmehê ya ku xwe dispêrê fikra Netewa Demokratîk wê ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk, pir-rengî û ne-navendî bibe bingeh." *R-4*

## Qendîl çiyayê hemû kurdan e



Serokê Giştî yê Partiya Azadî û Sosyalizmê OSP'ê Sînan Çîftyurek daxuyaniya Serokê Rêveberiya Başûrê Kurdistanê Neçirvan Barzanî a derbarê Qendîlê de rexne kir û got, "Divê Kurd li dijî vê yekê helwesta xwe nişan bidin. Çawa ku Efrîn û Şengal ya hemû kurdan e, Qendîl jî çiyayê hemû kurdan e." *R-4*

# Xezeba Zeytûnê Tola Efrînê hiltîne

**_Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê daxuyaniyeke nivîskî weşand û diyar kir şervanên wan li herêma Etmê ya Îdlibê li çeteyên dewleta Tirk dan. Di çalakiyê de 5 çeteyên Feyleq El Şam hatin kuştin. Di daxuyaniyê de wiha hat gotin, "Em tekez dikin ku her kesê ku destê wan di dagirkirina Efrînê de heye, wê hesabên mezin ji wan were xwestin."_**



Şervanên Odeya Xezeba Zeytûnê li herêma Etmê ya Îdlibê li çeteyên dewleta Tirk dan. Di çalakiyê de 5 çeteyên Feyleq El Şam hatin kuştin, 6 jî birîndar bûn. Depoya cebilxaneyan a çeteyan jî hate teqandin.
Odeya Çalakiyan a Xezeba Zeytûnê daxuyaniyeke nivîskî weşand û li ser çalakiya li Îdlibê agahî da.
Di daxuyaniyê de hate ragihandin ku hêzên wan 16'ê Tîrmehê li dijî çeteyên Feyleq El-Şam li herêma Etmê ya parêzgeha Îdlibê çalakî pêk anîn.
Di daxuyaniyê de hate gotin ku di encama çalakiyê de depoya cebilxaneyê û kargeha boyaxê hatin teqandin û 5 çete hatin kuştin û 6 jî birîndar bûn.

**WÊ HESABEKÎ MEZIN BIDIN**

Di dawiya daxuyaniyê de ev hişyarî hate dayin:
"Em tekez dikin ku her kesê ku destê wan di dagirkirina Efrînê de heye, wê hesabên mezin ji wan were xwestin. Dewleta Tirk a dagirker nikare wan biparêze. Pêwîst e ji Efrînê derkevin. Hetanî ku gelê Efrînê koçberî be, wê yek ji çeteyan di malê xwe de rehet nemîne. Em li hemû deverên ku zilm û zordarî ji aliyê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ve li ser gelê me tê meşandin em li wê derê ne. Ji ber vê yekê jî em soz didin her kesê ku destê wan di dagirkeriya Efrînê de heye û mal û milkên gel talan kirin û heqaret li gel kirin, wê hesabên giran ji wan werin xwestin. Wekî ku me soz da we, tiştên tên girantir in. Efrîn, sebir bike, tolhildan tê."

## Sedema aloziya Sûriyê navendîbûne

Kesayet, siyasetmedar û endamên opozîsyonê yên tev li Foruma Danûstandinê ya Sûrî-Sûrî ku li Girê Spî tê lidarxistin, bûn di beşa yekem a forumê de ku bi navê "Bingeha dîrokî û aloziya Sûriyê" pêk hat, tekez kirin ku siyasetên ku rêjîma Baas bi feraseta yek al û yek netewe dimeşîne, bû sedema ku aloziya Sûriyê kûr bibe. Beşdaran her wiha destnîşan kir ku pêkan e ku sîstema nenavendî bibe sedema derxistina Sûriyê ji aloziya heyî.
Foruma Danûstandinê ya Sûrî-Sûrî li navçeya Eyn Îsa ya kantona Girê Spî (Til Ebyed) bi beşdariya hejmareke zêde ji kesayetên siyasî û muxalîfên ji gelek bajarên cuda û herêmên Sûriyê bi dirûşma "Danûstandina Sûrî-Sûrî hevdîtina avaker e" pêk hat.
Di beşê yekem a forumê ku bi navê "Bingeha dîrokî û aloziya Sûriyê" hate lidarxistin.
Foza Yûsif di forumê de axivî ev tişt anîziman: "Sûriya beşek ji



Rojhilata Navîn e, gelek zehmetî û zordarî ji kiryar û siyasetên lê hatin meşandin, kişandin. Dewleta neteweyî ku di sedsala 20'an de hate avakirin, bû sedema aloziya ku niha li herêmê pêk tê. Netewedewlet li ser esasê înkar û redkirina pirrengiya di nava civakê de hatiye avakirin. Hîmên wê yek netewe, yek al û yek ol e, ev jî dibe sedema aloziya herêmê kûrtir bibe, ji ber ku li ser esasê dîktatoriyê hatiye avakirin. Em hemû li ser vê erdnîgariyê dijîn, lê em heta niha nebûne xwedanê welatekî. Sûriyê ne bûbû welatekî hevbeş ji bo hemû pêkhateyên xwe."

## Hêzên gerîla li artêşa Tirk a dagirker dan

Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê diyar kir ku li Mêrdîn, Amed û Bedlîsê çalakî hatine lidarxistin.
Li gorî daxuyaniya HPG'ê li navçeya Farqîn a Amedê '2 kontra' hatin kuştin, li Mêrdînê derb li wesayita leşkerî hate xistin û li Tetwanê jî çalakî hate kirin.
Navenda Ragihandin û Çapemeniyê ya HPG'ê ev daxuyanî da:
"Hêzên me di çarçoveya Pêngava Şoreşgerî ya Şehîd Delal Amed û Şehîdên Bestayê de şeva 12'ê Tîrmehê saet 23:30'î li dijî leşker û kontrayên li ber bendava li navçeya Farqîn a Amedê bûn çalakiyek kirin. Derbên xurt li çeperên dijmin hatin xistin û di encamê de 2 kontra hatin kuştin.
16'ê Tîrmehê saet 05:40'î, hêzên me li ser rêya navbera navçeyên Tetwan û Xîzanê yên Bedlîsê li nuqteyeke artêşa TC a dagirker xistin. Derbên giran li çeper û stargehên dijmin hatin xistin, lê hejmara leşkerên mirî û birîndar nehate zelalkirin.



## Em li pişt wekîlên xwe ne yên ku tevlî merasîma gerîla bûn


HDP'yiyan destnîşan kirin ku ew li pişt wekîlên xwe ne yên tevlî merasîma cenazeyê gerîla Mehmet Yakişir bûne.
Parlamenterên HDP'yî Remziye Tosûn û Mûsa Farîsogûllari ji ber ku tevlî merasîma cenazeyê gerîlayê HPG'ê Mehmet Yakişir bûn ketibûn ber lêpirsînê. Polîsên Tirk avêtibûn ser Mala Serxweşiyê ya li Lîce Dercîmtê. Rêxistina HDP'ê ya Amedê li ser mijarê civînek li dar xist.
Civîna çapemeniyê li avahiya partiyê pêk hat û hêjmareke zêde parlamenterên HDP'yî tevlî bûn.
Hevserokê HDP'ê yê Amedê Çamçi got, "Em Kurd, vê rejîmê û kiryarên wê ti carî qebûl nakin. Em dixwazin bêjin ku nerazîbûn, têkoşîn û berxwedana me ya li dijî vê yekê wê bibiryardarî bidome.
Parlamenterên me Remziye Tosûn û Mûsa Farîsogûllari li gorî rastiya gel têkoşîna siyasî dimeşînin. Hûn çiqasî hewl bidin krîmînalîze bikin jî, wekîlên me li gorî rastî û pêwîstiya gelê me tevdigerin.
Em bi Remziye Tosûn û Mûsa Farîsogûllari serbilind in ku ji ber beşdariya li merasîma cenaze ketine ber lêpirsînê. Ji aliyê exlaqî û dînî ve bi ti awayî ne sûc e ku mirov tevlî merasîma cenazeyê gerîlayekî bibin, êşa malbata wî mirovî parve bikin û li cem wan bisekinin."
Çamçi nerazîbûn nîşanî serdegirtina li mala serxweşiyê da û destnîşan kir ku ev yek hêrsa gel zêde dike. Çamçi êrîş bi tundî şermezar kir û got, "Em careke din radigihînin ku em ê bi dilsoziya bi nirên xwe vê têkoşînê bidomînin."
HDP'yî piştî daxuyaniya çapemeniyê berê xwe dan mala sersaxiyê ya Mehmet Yakişir ê HPG'yî.



## Dagirkeran li Efrînê sivîlekî din kuştin

Abdulrehman Xec Xelîl ê 40 salî li Efrînê ji aliyê hêzên dagirker ve hate kuştin.
Abdulrehman Xec Xelîl ji aliyê çeteyên Ehrar El-Şerqiye yê dewleta Tirk ve bi êşkenceyê hate kuştin.
Li kantona Efrînê ku ji aliyê artêşa Tirk a dagirker û çeteyên wê ve hatiye dagirkirin, sivîl bi rengekî hovane êşkenceyê dibînin, tên revandin, kuştin û destdirêjî li wan tê kirin. Tê texmînkirin ku ji meha Adarê ve 3 hezar kes hatine revandin.
Ji navend û derdora Efrînê ji 7 hezar kesî agahî nayê girtin.







# "Lêgerîna Heqîqetê"li Rimêlan hate pêşkêşkirin

**_Koma Şanoyê ya Hêvî-Yekta ku ji Wargeha Mexmûr hatiye rojava, tûra şanoyên xwe berdewam dike. Piştî li Qamişlo û Kobanê vê carê jî li ser dika navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgiran a bajaroka Rimêlan şanoya "Lêgerîna Heqîqetê" hate pêşkêşkirin._**



Koma Şehîd Hêvî-Yekta ya ku ji Wargeha Mexmûrê hatiye Rojava, şanoya xwe ya "Lêgerîna Heqîqetê" vê care li ser dika Çand û Hunerê ya Aram Tîgiran a bajaroka Rimêlan pêşkêş kir.
Koma Şanoyê ya Hêvî-Yekta ku ji Wargeha Mexmûr hatiye rojava, tûra şanoyên xwe berdewam dike. Piştî li navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya bajarê Qamişlo û Baqî Xido ya Kobanê şanoyên xwe pêşkêş kirin vê carê jî li ser dika navenda Çand û Hunerê ya Aram Tîgiran a bajaroka Rimêlan şanoya "Lêgerîna Heqîqetê" hate pêşkêşkirin.
Bi sedan şêniyan ji bo temaşekirina şanoyê berê xwe dane navendê.
Rêveberê Koma Azad Tekîn bixêrhatina beşdaran kir û got, "Naveroka şanoyê peyameke ji bo gelê Kurd e, tê de behsa polîtîkayên asîmîlekirina çanda kurdî tê kirin."
Piştî axaftinê, şano hate pêşkêşkirin. Naveroka şanoya "Lêgerîna Heqîqetê" li ser gundek Bakurê Kurdistanê ku di bin polîtîkayên dewleta Tirk a dagirker de tê asîmîlekirin û bi rêya çeteyên olî tê parçekirin dike mijara xwe. Ciwanê bi navê Xwezan piştî demekê ku beriya çend salan malbata wî ji bo Elewî bûne ji aliyê dewletê ve hatî derxistin dizivire gundê xwe. Xwezan bi gelê gund re sîxurê bi navê Mele Qasim tespit dikin û ji gund diqewitînin. Piştî ku şano bi dawî bû gel bi durûşme û çepikan spasiya xwe pêşkêşî komê kirin.

## Koma kulîlkên dibistanê a çand û huner

**Ferîşte NEZÎR**

Bi armanca ku afrîner û berhemdarên çand, huner û werzîşê li gel şagirtan pêş bikeve, Komîteya çalakiyên dibistanan yên çand, huner û werzîşê navendên perwerdekirina şagirtan ser amûrêm mûzîk, şano, dîlan û werzîşê di bin sîwna Desteya Perwerdê ya Herêma Cizîrê û bi alîkariya KPC'ê Demokratîk li bajarê Qamişlo li milê Şerqê û Xerbî hatine vekirin.

**KOMA KULÎLÊN DİBNİSTANÊ**

Di dibistna Ilmaz Xelîl de gelek kom hene, komên werzîşê, alavên mûzîkê, wênsaziyê û çand û hunerê hene, her komek mamosteyên taybet wan perwerde dikin. Yek ji van koman jî Koma Kulîlkên Dibistanê ya çand û huner ku ser hersê beşê hunerê Mûzîk, şano û dîlan perwerdeê dibînin. Ev kom ji 15 şagirtan pêk tê û temenê wan ji 8 salî heya 16 salî ne, ku ev kom beriya mehekê beriya mekê hatiye avakirin.



Têkîldarê mijarê Rojnameya Ronahî bi armanca şopandina xebatê perwerdê û naskirina komên di dibistanê de perwerde dibîn serdan Dibistana Ilmaza Xelîl a milê şerqî kir mamoste û şagirtan diyar kirin ku civakek çanda wê tunebe nikare bi dem dirêjî jiyan bibe, di heman demê de çand jî bê civak nabe."

**AMADEKARİYÊN DU ŞANOYAN DİKİN**

mamosteya koma Kulîlkên dibistanê Mizgîn Yilmaz ser çawanî û tevlîbûna şagirtan ji perwerdê re wiha got: "Ev kom ji 15 endaman ji temên cuda pêk tê, di heftiyê de 3 rojan perwerdê ser şano, stran û govendê dibîni. Rastî ev şagirtana bi heycan û xwestekek mezin tevlî perwerdeyên xwe dibin. Her wiha çend şagirt hene ku xwedî denê xweş û li sazê jî dixin. Ev kom heya niha ser du şanoyan perwerdê dibînin şanoyek bi armanca piştgirtiya berxwedana Serdemê ye û yadin jî ser mijara zewcandina temen biçûk û bandora wê neyînî ser keç û civakê tê vegotin."

**HUNER TİŞTEKÎ XWEZAYÎ YE**

Mizgîn bi bîrxistin ku ev kom beriya niha jî li mihrîcana zarokan û şahiya bi dawî kirina dibistanna jî şano, stran û dîlan pêşkêş kiribûn û wiha bi dawî kir: "Di koma kulîkên dibistanê de ne tenê şano, dîlan û stranê kurdî didin, di vê komê de 4 ji netewên ereb jî hene, ji bo wê jî him çanda kurdî û erebî jî tên dayîn. Çand tiştekî xwezayîye, ji ber ku her kes bi xwendinê dikare bibe bijîjk, mihendis, mamosta û hwd. Lê nikare bibe hunermend. Ji ber ku huner tiştek xwezayîye ji dayîkbûnê bi mirovan re peyda dibe."

Şagirtê bi navê Sercan Sarîk ku di hersê beşand cihê digre wiha nerînê xwe anî ziman: "Ez ji biçûkaniya xwe de ji çand û hunerê hezdikim, her wiha dayîka min, jî di destpêka şoreşê de endameke çand û hunerê di beşê şano de bû. Em bi vê perwerdê kêfxweşim, ji mamoste û perwerdeyên xwe hezdikin."

## Salih Osê di 40 rojiya wefata xwe de hat bîranîn



Hunermendê Kurd Salih Osê di 40 rojiya wefata wî de hate bîranîn.

Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Cizîrê bi armanca bîranîna hunermendê Kurd Salih Osê ku 40 roj li ser wefatê wî re derbas bû, civînek li navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo ya li bajarê Qamişlo lidar xist.

Di civîna bîranînê de, endamên tevgerên çand û hunerê yên herêmên Cizîrê, rewşenbîr, helbestvan, malbat û hevalên Salih Osê amade bûn.

Piştî rêzgirtinê Cîgirê Hevserokên Desteya Çand û Hunerê ya Kantona Cizîrê Hena Hena axivî û li ser kesayeta hunermend Salih Osê ev tişt anî ziman, " Salih Osê yek ji hunermendên navdar e, di dilê hemû şagirtên xwe de hezkirina hunerê, civakbûyînê çand."

Li ser navê Yekîtiya Hunermendan a herêma Cizîrê Elî Abdullah jî da zanîn ku Salih Osê yek ji damezrînerên Yekîtiya Hunermendan a herêma Cizîrê bû û got, "Salih Osê roleke mezin di zindîkirina kevnoşopiyên kurdî de lîst. Em ê jî heya dawiyê şopdarên riya wî bin."

Biranîn bi stranên koma Stêrvan û Peymangeha Rojava bi dawî bû.



## Dengbêjî vegotina civakê ye

**Hozan Seyîdxan**

Mirov dikare bêje ku dengbêjî, damara çanda civaka demokratîk-Neolotîk ya ku rengê kurdan derdixe, ya herî xurt e.
Di destpêkê de em vê yekê bêjin, ev mijar pir berfireh e û li ser vê mijarê nêrîn danîn û lêkolîneke mezin dixwaze. Encax çend gotinên ku bê gotin û ji bo ku nêrîn hîn baştir di ciyê xwe de rûnê, di dengbêjiyê de dengbêj û cihê çîrokên wan ku de re, mînaka herî baş tê zanîn e.
Ji çand û zargotina gelê Kurd ya dîrokî beşek bingehîn me got dengbêjî ye. Denbêjî bi jiyana gel ve girêdayî ye an jî qewmîna têgihên jiyanê bi xwe ye. Ne şîn bê kilam dibe, ne jî şayî… Dema tunebûn û tenêbûnê kilam ji kurdan re dost û yar e. Civaka kurdan bê kilam û dîlan nameş e… Dema evîntiyê, dilxweşiyê dostê herî dilsoz kilam e. Dema bêgumaniyê kilam guman e… Dayîk bi kilaman zaroka xwe şa dikin, bi kilaman dergûşa xwe radizînin… Bi kilaman bûka xwe siwar dikin… Bi kilaman mêrxwasên xwe dişînin şer, heta bi kilaman mirîyên xwe vedişêrin… Şivan bi kilam û bilûrê pezê xwe diçêrînin, cotkar bi kilaman cot dikin… Kurd bi kilaman laqirdiya dikin, bi
kilaman dikenin, bi kilaman digirîn…
Dengbêjî kevneşopiyeke gelekî girîng e. Di dîrokê de kurd tim mecbûr man in ku çanda xwe bi "deng" an jî bi "gotinan" dewrî nifşê bê bike. Ji ber ku "nivîs" û "pirtûk" di nav kurdan de zahf kêm bû. Yanî di hêla gotin, kilam, stran û çîrokan de, bi gotinên dengbêjan hetanî roja îro hatîye û wenda nebûye.
Mînak, evdalê zeynikê ku bi kilam û dengbêjiya xwe bû ye cavkaniyeke resen ji nivis û civaka me kurdan re. Her wiha canda me bi serpêhatî, û cîrokên mêrxasî geleke dewlemende, ku îroj li ser zar û zimanan weke efsane ji mere mane, mînk. Keer û kulik, ferhat û sêrîn, sêva heciya, sibend û xecê, derwês û edûlê, û bi dehan destanên ku hê nehatine ziman vesartî mane.

Der barê rehên denbêjiyê de mirov dikare koka dengbêjiyê heta neolîtikê jî bibe. Divê denbêjî ne tenê bi stran û klaman bê nirxandin, tarza wê, tevger û bizavên wê, li gorî taybetmendiya wê bê nirxandin. Her wiha li Kurdîstanê dengbêjî ji qirêjiya kapîtalîzmê tesîr negirtiye. Li gorî çavkaniya Felsefeya Zerdûştî hatiye hunandin û bi taybetî ji koletiyê û axatiyê pir tesîr girtiye.

Di nava tariya hezar salan de gelê me bê hesab cewahirên xwe yên jîyanî û nirxên giranbiha wenda kiriye. Gelo ji nezaniyê ye, ji bêxemiyê ye an jî qeder e, ev jî hêjayî nîqaşê ye. Gelek caran hatiye gotin û hîn jî tê gotin ku " tiştên çû, nede dû!.." Ev rastiyek me kurdan e. Li peyneketina nirxan bi wî awayî winda bûye û niha jî bi destxistina van nirxan em dizanin çiqas zor bûye. Lê, tiştên ku bi dest ketiye û tiştên ku ji niha pê de bi destkeve jî pêwîst e em ji destê xwe bernedin. Gereke em baş bifikirin ku çawa wan nirxên civakê yên mayî ji windabûnê xelas bikin û bikin malê dîrokê.

# Salvegera 19'ê Tîrmehê hat pîrozkirin

**Salvegera 7'an ya Şoreşa Rojava li Zanîngeha Rojava ya li Qamişlo hat pîrozkirin. Endamên Rêvebiriya xweser jî beşdarî pîrozbahiyê bûn. Li ser girîngiya şoreşa 19'ê Tîrmehê axaftin hatin kirin û hat diyar kirin ku şoreşa di aliyê wekhevî demokratîkbûnê de ji cîhanê re bû mînak."**



Zanîngeha Rojava bi minasebeta pîrozkirina 19'ê Tîrmehê roja destpêkirina Şoreşa Rojava şahiyek li dar xist.
Zanîngeha Rojava ya li bajarê Qamişlo bi minasebeta pîrozkirina 19'ê Tîrmehê roja destpêkirina Şoreşa Rojava şahiyek li dar xist. Şahî li salona Zanîngehê pêk hat. Rêveber, mamoste û xwendekarên zanîngehê jî tev li şahiyê bûn. Her wiha wek mêvan hevserokê Desteya Rêveberiya Xweser a Demokratîk Ebdulkerîm Saroxan, hevseroka Desteya Werzîşê ya Ciwanan Hemrîn Elî, hevserokê Meclisa Zagonsaz Hakem Xelo û koma muzîkê ya Erka Xweparastinê tev li şahiyê bûn.
Ebdulkerîm Saroxan li ser girîngiya rojê axivî û diyar ku dema ew xwe di nava xwendekarên Zanîngeha Rojava de ku berhemeke Şoreşa Rojava ye, dibînin, pir hestiyar dibin. Saroxan da zanîn ku Şoreşa Rojava bi xwe re gelek destkeftî anîn û wiha axivî: "Cudahiya vê şoreşê ji şoreşên din ew e ku şoreşên din xwe spartin destê xelkê, Şoreşa Rojava bi îradeya gel û bi hêza ciwanên gel bi pêş ket. Hiştin ku zarokên wan ji bo jiyaneke azad canê xwe bidin û vê şoreşê karibû di saziyên civakî de xwe bi rêxistin bike, mînaka wê jî saziyên perwerdeyê ne."
Piştî axaftina Saroxan, Koma Çira şanoya bi navê "Rê" pêşkêş kir, piştî wê koma muzîkê ya Sazkar û herî dawî jî koma muzîkê ya Erka Xweparastinê xwendekar coşandin.

## Akademiya Ciwanan dewreyeke din bi dawî kir



Li Akademiya Şehîd Baz Mordem a Yekîtiya Ciwanên Rojava dewreya perwerdeyê ya endamên yekîtiyê bi dawî bû.
Li Akademiya Şehîd Baz Mordem a Yekîtiya Ciwanên Rojava (YCR) ya li gundê Til Marûf ya navçeya Tirbespiyê 15 roj berê ji bo 12 endamên yekîtiyê yên herêmên Bakurê Sûriyê dewreyeke perwerdeya bîrdozî bi navê "Şehîd Baz" hatibû vekirin.
Ji Reqayê Xelef El-Hadî tevlî dewreya perwerdeyê bibû derbarê tevlîbûna xwe diyar kir ku piştî bidawîbûna dewreyê, di kesyeta wî de gelek guhertin çêbûye û got, "Di perwerdeyê de me girîngiya rola ciwanan di avakirina pêşerojê û şêwazên şerê taybet ku ciwan hedef digire nas kirin."
El-Hadî, bang li hemû ciwanên Bakurê Sûriyê kir ku beşdarî dewreyên perwerdeyê bibin da ku karibin li hemberî her keleman bisekinin û rola xwe di civakê de pêk bînin…*ANHA*

## Şaredariyê dest bi sererastkirina rêyan kir



Şardariya Gel a Dêrikê hemleya sererastkirina rêyan da destpê kirin
Şaredariya Gel a Dêrikê di çarçoveya pilansaziya îsal de, ku hemû rêyên sereke û yên di nava kolanan de yên xirabkirî werin serersatkirin, hemleya qîrkirina rêyan da destpêkirin.
Pêngava sererastkirina rêyan ji kolana Kornêş destpê kir û wê hemû rêyên ku zirar dîtine werin sererastkirin.
Endamê Şaredariyê Hisên Mihemed ku li ser projeya sererastkirina rêyan disekine anî ziman ku şênî ji ber xirabûna rê astengî dikişandin û sererastkirina rêyan di pilansaziya şaredariyê de ye.
Hisên Mihemed diyar kir ku hemle berdewam dike ta hemû rêyên zirar dîtine werin sererastkirin.
Welatiyê bi navê Xebat Ebdullah spasiya şaredariyê kir û diyar kir hemle gaveke serkeftî bû. Xebat her wiha hêvî kir ku şaredarî daxwazên welatiyan bi cih bîne û mîna van projeyan berdewam bike.
Silêman Temê jî yek ji welatiyên bajarê Dêrikê ye spasiya şaredariyê kir û daxwaz kir projeyên bi vî rengî berdewam bike…*ANHA*

## Rêveberiya Sivîl bi gel re civînan lidardixe



Li Minbicê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk lidarxistina civînan ji welatiyên herêmê re didomîne.
Li Minbicê Rêveberiya Sivîl a Demokratîk li Meclisa Sivîl a navçeya Ebû Qelqel bi armanca nirxandina aliyê xizmetguzarî li navçeyê, civînek ji şêniyan re li dar xist.
Cîgira Hevserokatiya Komîteya Tenduristiyê Mûna Zekeriya, hevserokê Komîteya Şaredariyan Ebdulcelîl Îbrahîm, yek ji rêveberên Meclîsa Rêveberiya Xetan Fatma Beko, endamên Meclîsa Dada Civakî û bi dehan şêniyên navçeyê beşdarî civînê bûn.
Endamên rêveberiyê li xwestek û pirsên şêniyan ên di aliyê xizmetguzariyê de guhdar kirin. Hevserokê Komîteya Aborî Mihemed Sebrî diyar kir ku ew wek Rêveberiya Sivîl a Demokratîk hewl didin pirsgirêkên şêniyan çareser bikin û li nêrîn û pêşniyarên wan guhdar bikin, her wiha destnîşan kir ku wê li gorî derfetên xwe pirsgirêkên şêniyan çareser bikin…*ANHA*

## EW ROJ
## Komkujiya Pirsûs



Farûk SAKIK

15ê îlona 2014an çeteyên DAIŞê bi armanca dagirkirina herêma Kobanê careke din dest bi êrîşan kirin. Şeva 15ê îlonê ji rojava, başûr û rojhilatê herêmê ve êrîş pêk anîn. DAÎŞ, di êrîşên xwe de, hemû cure çekên giran li dijî Kobanê bikar anî.
Êrîşên çeteyên DAIŞê ku bi armanca dagirkirina Kobanê hatibûn destpêkirin 133 roj berdewam kir. Di êvara 26ê Çileya sala 2015an de ew mizginiya ku ne bi tenê Kurd, hemû cihan li bendê bû ji ajansa derbas bû: Kobanê êdî rizgar bibû.
Dema li Kobanê şer dewaam kir, ji bo dorpêçandina kobanê were şikandin, pêwistî bi enîyek nû hebû. Navê vê eniya nû "Pirsûs" bû. Ev bajarê ku heta wê demê haya tu kesî jê tunebû, ewê ji dostê kurdan re malovanî bikira. Ji gelek deverên Bakûr û ji Tirkiyê însan dihatin wêder, piştgirî didan berxwedana Kobanê.
300 ciwanên endamên "federasyona Komeleyên ciwanên sosyalîst- SGDFê" bi slogana 'me bi hevdûre Kobanê parast, emê bi hevre avabikin' kampanyayek dabûn destpêkirin.
Afîşek amadekiribûn û digotin di navbera 19 û 24 Tîrmehê de em li Kobanêne. Û ew roj hat beriya ku birêkevin ev cîwan daxwiyaniyek jî dabûn çapameniyê. Ji bo zarokan eşya komkiribûn. Dixwestin li Kobanê ji "baxçê zarokan" çêkin , daristanek û pirtûkxaneyek avakin.
Di 19ê mehê de li Pirsûs bûn. Û li wê derê ji aliyê rêveberên HDP û DBPê hatin pêswazî kirin.
Polîsan jî hatina wan bihîstibû. Dema gihîştin bajêr, polîsan kontrola nasnameya van ciwanan kir. Hêzên dewletê ji bo ev hewldanên van cîwanan were asteng kirin çi ji dest wan dihat pêk danîn.
EWROJ......
Di sibeha 20 Tîrmehê de li navenda çanda Amara bûn. Li baxçê avahiyê taştê xarin. Sibehê fotografek giştî li baxçê avahiyê kişandin û di medya civakî de jî parvekirin. Piştî demek derbasî baxçebûn ku daxwiyanî bidin çapemeniyê.
Lê ew roj hin tiştên ku ne di rê de pêkdihatin. Li derdora polîs anjî hêzên ewlekariyê tunebûn. Li Pirsûsê bêdengiyek hebû.
Û ev bêdengî saet derdora 12an de, di kêliyê daxwiyanî didan çapameniyê bi teqînek dawî bû. Ew roj li Pirsûs komkujî hebû.
Di encama teqînê de 25 ciwanan li navenda çanda Amara û 6 kesan jî li nexwesxanê jiyana xwe ji dest dan. Bi dehan ciwan jî birîndar bûn û ew rakirin nexwesxaneyan.
Saet derbas bûn di ajansan de navên van 32 kesên jiyana xwe ji destdane hat anons kirin.
Alper Sapan, Alî Can Vûral, Aydan Ezgî Salcı, Buşra Mete, Cebraîl Gunebakan, Cemîl Yıldız, Çagdaş Aydın, Dîlek Bozkurt, Ece Dînç, Emrûllah Akhamûr, Erdal Bozkûrt, Ferdane Kiliç, Hatice Ezgi Saadet, Îsmet Şeker, Kasım Deprem, Koray Çapoglu, Medalî Barûtçû, Mehmet Alî Vural, Mucahît Erol, Murat Yûrtgul, Nartan Kılıç, Nazegul Boyraz, Nazli Akyurek, Okan Pîrînç,Osman Çîçek, Serhat Devrîm, Suleyman Aksû, Ugur Ozkan,Veysel Ozdemir, Yunus Emre Şen û 2 jinên ku hê nasnameya wan nehatiye diyarkirin.
Piştre herî dawî hejmara kesên ku hat qetilkirin derket 33an.
Cenazeyên kesên ku di komkujiyê de jiyana xwe ji destdan şandin bajarê wan. Li vanderan bi merasimên girseyî hatin defin kirin. Birîndar jî gelek zêdebûn, ew rakirin nexweşxaneyan.
ÎROJ.....
Xeyalek wan hebû ku li Kobanê daristanek avakin. Piştî komkujiyê ev xeyalê wan ji aliyê rêveberiya Kantona Kobanê ve pêkhat. Li kêleka "Goristana Şehîdên Kobanê", daristanek ji bo şehîdên Pisûs hat avakirin.
Îroj gelek hevalên van şehîdan derbasî rojavabûnin. Hin ji wan tevlî şervanên YPG-YPJ bûn û hin jî wan di nav xebatên ji nû de avakirina Kobanê de cîh girtin.



# Sê zarokên xwe diyarî şoreşê kir

***Dayîka Cemîla Nûhê ya ji Til Teltemirê sê zarokên xwe diyarî şoreşa Rojava kiriye û her sê zarokên wî yên bi navê Mazlûm, Hogir û Şehreman di ber şoreşê de canê xwe feda kirine û şehîd bûne. Dayîka Cemîleyê wiha got, "3 zarokên min ji bo axa xwe û rûmeta xwe biparêzin li dijî dijmin re şer kirin û şehîd ketin."***



Ji dîrokê heta niha gelê Kurd her dem di bin mêtingerî û dagirkeriya desthilatdaran de têkoşîna jiyanê dane. Li ser her çar parçeyên Kurdistanê berxwedanên bê hempa yên li dijî mêtingerî û dagirkeriyê mohra xwe li dîrokê xistiye. Yek ji vê berxwedana ku mohra xwe li dîrokê xist 19'ê Tîrmeha 2012'an Şoreşa Rojava ye. Gelek berxwedêrên ku di doza têkoşîna azadiyê de jiyana xwe ji dest dan îro bi rûmetdariyek mezin tên bibîranîn.
Bê guman di doza têkoşîna azadiya Kurd de dayikên Kurd xwedî rol û misyonek gelek girîng in. Dayikên Kurd ji dîrokê heta niha bi ked, hêvî û hêsirên xwe yên pîroz doza têkoşîna Kurd parastine. Yek ji wan dayikan Cemîla Nûhê ya ji Til Teltemirê ye ku wê jî parçeyek ji kezeba xwe diyarî Şoreşa Rojav kiriye û 3 zarokên wê ji bo azadî û aştiyê di 19'ê Tîrmeha 2012'an Şoreşa Rojava de canê xwe feda kirin.
Dayika Cemîla Nûhê da zanîn ku ew çi ji bo doza têkoşîna azadiya Kurd bike hindik e û got: "3 zarokên min Mazlûm, Hogir, Şehreman ji bo axa xwe û rûmeta xwe biparêzin bi dijmin re şer kirin û şehîd ketin. Parastina axê parastina rûmetê ye. Wan rûmeta xwe heta dawî parast. Îro bi saya xwîna şehîdên xwe bi saya Şoreşa Rojava em bi awayekî azad dijîn. Bedelê wê her çiqas giran be jî bi Şoreşa Rojava Gelê Kurd serkeftin û destkeftiyên mezin bi dest xistin."

**VEGERIN SER AXA XWE**

Dayika Cemîla bang li hemû kesî kir ku vegerin ser axa xwe û wiha dewam kir: "Divê em hemû destên hevdu bigirin û li dijî neyarên ku îro dixwazin destkeftiyên me vala derxin em têbikoşin. Têkoşîn û berxwedana gelê Kurd û şehîdan hêjayî pesindayinê ye. Em feyzê ji berxwedana şehîdên xwe digirin û em ê heta dawî şopdarê rêya wan bin."Cemîlayê di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em ê wekî dayikên şehîdan li hemberî dijmin bisekinin. Em ê jî wekî şehîdên xwe heta dawî axa xwe û rûmeta xwe biparêzin. Bi keda şehîdên bi rûmet Şoreşa Rojava pêk hat. Em ê jî xwedî li doza şehîdan derkevin. "

## Hêza gel wê Îranê demokratîk bike



Hevseroka PJAK'ê Zîlan Vejîn diyar kir ku divê rejîma Îranê biguhere û got, "Dînamîk û hêza bingehîn a ku Îranê demokratîk bike jin û gelên Îranê ne."
Guhertinên girîng li Rojhilata Navîn rû didin, di mijara demokratîkkirina sîstemê de guhertinê li ser dewleta Îranê jî ferz dikin. Li pêşberî guhertinên rû didin û serhildanên gelan ên ji bo çareseriya pirsgirêkan, rejîma Îranê ancax bi muxatabgirtina dînamîk û cihêrengiya navxweyî dikare xwe dest bi pêngaveke demokratîkbûnê bike û xwe ji kaos û krîzê rizgar bike.
Di pêvajoyeke wiha de PJAK û KODAR ku demeke dirêj e ji bo demokratîkbûna Îranê têdikoşin, ji bo çareseriya pirsgirêkan projeyeke çareseriyê ya hevpar pêşkêşî dewleta Îranê kirin. Hevseroka Partiya Jiyana Azad a Kurdistanê (PJAK) Zîlan Vejîn projeya xwe ya çareseriyê nirxand.

**PROJEYA ME WÊ BIBE BERSIV**

Vejîn destnîşan kir ku projeya wan a çareseriyê ji aliyê naverokê ve berfireh û girîng e û got, "Ev projeya ku me ji bo demokratîkbûna dewleta Îranê pêşkêş kir, ji aliyê naverokê ve ji projeyên me yên beriya niha hîn berfirehtire.
Ji ber ku me di demeke wiha de pêşkêş kir, ji bo dewleta Îranê firsendek e ku karibe pirsgirêkên navxweyî û derve çareser bike. Mîna her projeya me, di vê projeyê de jî çareseriyeke ku hemû gelên Îranê digire nava xwe tê pêşkêşkirin. Pirsgirêkên navxweyî û derve yên rejîma Îranê bi rengekî zelal hatin diyarkirin û çareseriya pirsgirêkan jî qonax bi qonax hatin destnîşankirin."

**DESTWERDANA DERVE NE ÇARE YE**

Vejîn da xuyakirin ku ji ber pêvajoya heyî ya li Rojhilata Navîn, divê rejîma Îranê jî guhertinekê pêk bîne û wiha dewam kir: "Bêyî destwerdaneke ji derve, pêwîste vê yekê bi dînamîkên navxweyî bike. Ji ber ku destwerdaneke ji derve wê ji bo gelên Îranê nebe çareserî, berevajî wê pirsgirêkan girantir bike. Ev projeya me, bêyî destwerdana ji derve, çareseriya bi dînamîkên navxweyî esas digire."

**JIN PÊŞENGIYÊ DIKIN**

Hevseroka PJAK'ê Vejîn anî ziman ku li Îranê di nava hemû pirsgirêkan de ya herî girîng û çareserî jê re divê; pirsgirêka jinê ye û ev nirxandin kir: "Dema ku mirov bala xwe didin ser qadên têkoşînê, bi taybetî serhildanên ku nêzî salek in tên kirin, dibînin ku jin bi erka pêşengiyê radibin.
Berxwedana li zindanan a li dijî êşkence, zext û zordariyê bi pêşengiya jinê tê kirin. Ji ber ku di nava sîstema heyî de ya herî zêde tê talankirin û ji nedîtî ve tên jin e. Ev pirsgirêk ne pirsgirêka kêmneteweyekê ye. Hem pirsgirêkeke neteweyî ye, hem jî pirsgirêka hemû gelên Îranê ye."

**HEMÛ JIN DIVÊ TÊBIKOŞIN**

Zîlan Vejîn destnîşan kir ku divê hemû jinên li Îranê bi hev re têbikoşin û got, "Girîng e jin pêşengiyê ji projeya me ya çareseriyê re bikin. Divê armanca jinan ew e be ku dewleta Îranê ji nava kaos û krîzê derxînin û pêşî li destwerdana ji derve bigirin. Jin dikarin pêşengiyê ji demokratîkbûna Îranê re bikin."
Hevseroka PJAK'ê Vejîn anî ziman, muxatabê esasî yê projeya wan a çareseriya demokratîk gelên Îranê ye û diyar kir, muxatabekî din jî rejîm û hikumeta Îranê ye.

**SEDEMA PIRSGIRÊKAN POLÎTÎKAYÊN ŞAŞ E**

Vejîn da xuyakirin ku sedema pirsgirêkên navxweyî yên heyî, polîtîkayên şaş ên hikumetê ye û ji ber vê yekê divê hikumet çareseriyeke demokratîk biafirîne. Vejîn got, "Dema ku ev kir, lazim e deng û rengê hemû cudahiyên li Îranê esas bigire. Ji bo zîhniyeta dewleta tekparêz bê guhertin, pêwîstî bi guhertina destûra bingehîn heye."
Di dawiya axaftina xwe de Vejîn got, "Ji ber ku di destûra bingehîn de azadî û mafê cihêreng û jinan nayên naskirin. Çareserî; çêkirina destûra bingehîn a demokratîk e ku hemû cihêreng, jin û ciwanan di nava xwe de vedihewîne. Muxatabekî din jî mûxalîf, demokrat, sosyalîst û hemû hêzên ji bo azadî û demokrasiyê têdikoşin e. Ji bo çareseriya pirsirêka Kurd wezîfe û berpirsyariyeke mezin dikeve ser milê demokrat, welatparêz, sosyalîst û hêzên Kurdan. Ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd divê helwesteke hevpar nîşan bidin. Çawa ku ji bo çareseriya pirsgirêkên li Sûriye û Rojhilata Navîn Kurd bi erka pêşengiyê radibin, ji bo demokratîkbûna Îranê jî divê bi rola pêşengiyê rabin."…*ANF*

## 19'ê Tîrmehê bendên koletiyê şikand



Hevseroka Kantona Hesekê Semer Ebdullah derbarê Şoreşa Rojava de axivî û diyar kir ku di encama keda berxwedêran de ev serkeftin hat bidestxistin û got: "Di 19'ê Tîrmehê de bendên koletî û desthilatdariyê hat şikandin."
Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de bi Şoreşa Rojeva gelê Kurd di dîroka cîhanê de rûpelek nû vekir. Hevseroka Kantona Hesekê Semer Ebdullah derbarê Şoreşa Rojava de anî ziman ku Şoreşa Rojava Şoreşa Jinê ye û wiha got: "Şoreşa Rojava di pêşengtiya jina Kurd de mohra xwe li serkeftinek mezin xist."Semer Ebdullah da zanîn ku bi destpêkirina Şoreşa Rojava hem jinê hem civakê xwe birêxistin kirin û got: "Destkeftiyên Şoreşa Rojava ya herî girîng jê ew e ku jin û civakê zincîrên koletiyê şikandin û xwe bi rêxistin kirin. Di her qadên civakê de pêşketinên girîng çê bûn. Vê yekê bandorek erênî li ser jiyana jinê û civakê kir. Di warê perwerdeyê, siyasetê, çandê, hunerê, wêjeyê û leşkerî de jin bûn xwedî gotin. Bi avakirina Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) di warê ewlehiyê de gavên girîng hatin avakirin. Her wiha YPJ'ê li dijî DAÎŞ'ê têkoşînek girîng kir û gelek jin ji destên çeteyan rizgar kir. Bi avakirina Rêxistina Kongreya Star hemû jin hatin hembêzkirin û mafên wan hatin parastin. Di warê xebatên demokrasî û azadiyê de pêşketinên girîng çê bûn."
Semerê da zanîn ku berî Şoreşa Rojava pergalek nîjadperest û yekperest serdest bû û wiha domand:"Hemû gelên Sûriyeyê ji pergala serdest a nîjadperest û yekperest bêzar bûbûn. Loma serkeftina Şoreşa Rojava bû bersiva nîjadperestî û yekperestiyê. Ji bo hemû gelan bû rêya rizgariyê."
Semerê diyar kir ku bi Şoreşa Rojava li dijî pişaftinê jî serkeftinên mezin hatin bidestxistin û wiha dawî li axaftina xwe anî:"Gel di nav sîstema yekperest û yekalî de di nav talûkeya pişaftinê de dijiya. Koletî li ser civakê û bi taybet li ser jinê dihat ferzkirin. Lê bi Şoreşa Rojava sîstema desthilatdarî û koletiyê hatin hilweşandin û gel niha di nava rengekî demokratîk de dijî."…*Ronîda HACÎ/ Hesekê*

## Konferansa Kongreya Star a Heleb hat lidarxistin



Duyemîn Konferansa Kongreya Star a Heleb bi biryaran û hilbijartina meclîsa nû ya kongrê bi dawî bû.
Duyemîn Konferansa Kongreya Star a bajarê Helebê bi dirûşma "Bi rihê Berxwedana Serdemê em ê Şoreşa Jinan bikin şoreşa civakî" bi beşdarbûna 350 delegeyan û nûnerên partiyên Sûriya Pêşerojê, PYD'ê, Meclisa Sûriya Demokratîk, Hevgirtina Niştimanî ya Demokratîk, YPG, YPJ, Asayîşa Jin û şandeyek ji herêma Şehbayê hat lidarxistin.
Di konferansê de, Rêvebera TEV-DEM'ê ya taxa Şêxmeqsûd a Helebê Fehîma Silêman axivî û anî ziman ku Kongreya Star di salên dawî de di her aliyan de gavên girîng avêtin û got, "Li gel serkeftinan jî kêmasî di aliyê rêxistinbûyînê de derketin, sedemên kêmasiyan jî mercên ku tax têre derbas bû ye. Em bi hêvî ne ku kêmasî dîsa dernekevin."
Fehîma tekez kir ku di şerê li taxê rû da de, jin û dayikan rola pêşeng lîstin û di eniyên pêş de li ber xwe didan, bê westandin efsanên qehremaniyê xêz kirin.
Piştî xwendina rapora salane ya xebatên kongreyê nirxandin hatin kirin, li ser derbaskirina kêmasiyan nîqaş hatin kirin.Piştî nîqaşan bi erêkirina hemû endamên kongreyê rêze biryar hatin girtin. Di Konferansê de, Hêvîn Silêman, Nehla Mustefa, Fatima Hesen û Sîham Bîlal wekî endamên Koordînasyona Kongreya Star a Helebê hatin hilbijartinAxaftina dawî ya konferansê ji aliyê endama Kongreya Star Zelal Xebat ve hate kirin. Zelal Xebat, konferans li jinên Bakurê Sûriyê û Rojhilata Navîn pîroz kir û têkoşîna jina azad a rêxistinkirî silav kir û tekez kir ku li Rojava wê xeta Neteweya Demokratîk bişopîne û ji bo jiyaneke azad û bi rûmet têdikoşe. Konferans bi dirûşemyên "Jin, Jiyan, Azadî û Bê serok jiyan nabe" bi dawî bû.

# Şoreşa Rojava bi her awayî mînak e

***KNK'ê salvegera 6. a Şoreşa Rojava pîroz kir û destnîşan kir ku Şoreşa Rojava bi avakirina civaka demokratîk û bi sîstema xwe ya alternatîf bi serkeftî dewam dike. KNK'ê wiha got, "Şoreşa Rojava ne tenê di warê parastin û lehengiyê de, her wiha bi avakirina sîstema xwe ya xweser û nêzîkatiya demokratîk a li hemû gel û baweriyan bûye mînak."***

KNK'ê salvegera 6. a Şoreşa Rojava pîroz kir û destnîşan kir ku Şoreşa Rojava bi avakirina civaka demokratîk û bi sîstema xwe ya alternatîf, di şeşemîn salvegera xwe de jî bi serketî berdewam dike.

Desteya Rêveber a KNK'ê bi wesîleya salvegera 6'an a Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ku 19'ê Tîrmeha 2012'an dest pê kir, peyamek weşand.

Di daxuyaniyê de hate bibîrxistin ku gava pêşî li Kobanê hate avêtin û piştî azadkirina Kobanê, pêngav bi azadkirina Dêrik û Efrînê berfireh bû û gav bi gav li seranserê Rojavayê Kurdistanê belav bû.

KNK'ê destnîşan kir ku ev pêşveçûn û Şoreşa Rojava berdewam e û diyar kir, li gel vê yekê êrîşên li ser Rojava û bi giştî Bakurê Sûriyeyê, êrîşên têkbirina sîstema xweser, heta niha jî dewam dikin.

**ŞERÊ AZADIYÊ DEWAM DIKE**

KNK'ê bi bîr xist ku dewleta Tirk, bi erêkirina Rûsyayê û çavlêgirtina hêzên din ên navneteweyî, serê vê salê êrîşê Efrînê kir û dagir kir. Di dewama daxuyaniyê de hate gotin, "Li herêma Efrînê gel û şervanên azadiyê, berxwedaneke bê hempa meşandin. Ev berxwedan heta niha jî berdewam e. Dewleta Tirk û hevkarên wê, êrîş û tehdîtên xwe berdewam dikin. Dijminên gelê me û hevkarên wan li ser kar in. Bi her awayî êrîşên xwe yên hovane berdewam dikin. Li hember van êrîşan jî, şerê azadiyê, şerê têkbirina dagirkeriyê, bi qehremanî û bi dilsozî berdewam e."

Desteya Rêveber a KNK'ê da xuyakirin ku Şoreşa Rojava, bi fedakarî, bi qehremanî û bi xwîna pakrewanan bi pêş ve hatiye xistin û got, "Ji bo şoreş bi pêş bikeve, ji bo gel û welat azad bibe, bedelên gelek mezin hatin dayin. Berxwedana bê hempa ya keç û xortên Kurd, li seranserê cîhanê deng veda. Bi taybetî berxwedan û parastina Kobanê, bû sembol û bû destanek navneteweyî."

**ŞOREŞA ROJAVA BÛ MÎNAK**



KNK'ê diyar kir ku Şoreşa Rojava ne tenê di warê parastin û lehengiyê de, her wiha bi avakirina sîstema xwe ya xweser û nêzîkatiya demokratîk a li hemû gel û baweriyan bûye mînak û wiha dewam kir: "Bi taybetî li hember sîstemên herêmê yên kevn û desthildar, avakirina civak û sîstema alternatîf, di vê civak û sîstemê de rola jina azad, bûye mînakek cîhanî û bala tevahiya cîhanê dikişîne ser xwe. Rola jina Kurd di Şoreşa Rojava de kete rojeva cîhanê û bi baldarî tê şopandin."

Di dawiya daxuyaniyê de KNK'ê destnîşan kir ku Şoreşa Rojava bi avakirina civaka demokratîk û bi sîstema xwe ya alternatîf, di şeşemîn salvegera xwe de jî bi serketî berdewam dike.

KNK'ê şeşemîn salvegera Şoreşa Rojava li şervanên azadiyê û gelê Kurdistanê pîroz kir, di şexsê şehîdên Rojava de hemû şehîdên Kurdistanê bîr anî.

## Desthilatdariya Îtîhatparêz li dar e



Tayip TEMEL

Li Tirkiyeyê êdî rewşekî nû heye. Hemû derdor vê rewşê li gor sekn û pozisyona xwe pênase dikin. AKP vê yekê wekî şoreşek mezin peşkeş dike, Kemalîst wekî "têkçûna pergala demokratîk"… Li gor me ev yek ne şoreşke û ne jî rakirina pergala demokratîk e. Raste ev guherîn, destpêka pêşveçûnek otoriter û faşizan e. Lê pergala berê ne demokratîk bû ku demokrasi têk çûbe. Bi vê guherînê aliyê pergalê yê otoriter hîn xurtir bû ye. Ev yek şoreşek jî nîne ji ber AKP'ê pergala xwe di pêsîra pergala Kemalist de mayand û hîn jî bi derdorên îtîhatparêz re şirikatiyê dike. AKP vê guherînê wekî serkeftinek mezin ya ku li hemberê derdor û hêzên navneteweyî dide nîşan. Ev yek ne rast e. Ev guherîn bi erêkirin û piştgiriya hêzên emperyalist pêk hat. Di dawiya dawî de hêzên serdest yên emperyal rê dan vê guherînê alîkarî û piştgiriya AKP'ê kirin. Raste nakokiyê di navbera van hêzan de heye. Nakokiyê van hêzan bi AKP'ê re jî heye. Lê ev pergal li gel van nakokiya, li ser şirîkatiya van hêzan emrê xwe dirêj dike. Dîsa di qada navneteweyî de pêla rêveberiyên otoriter pêş dikeve. Ev otorîteriya pergalê ye. Li Amerîkayê Trump, li Rusyayê Trump, li Almanyayê Merkel çibe li Tirkiyeyê jî Erdogan ji bo vê pergalê ew e.

AKP li gel fikarên van hêzan hate ser xeta wan. Li gor daxwaza wan tevdigere. Van hêzan jî ji bo dizaynkirina Rojhilata Navîn pêwistî bi AKP û Erdogan dît. Ev hêz pêwistî bi Esad jî dibînin. Dema ku ev proje xistin meriyetê hevsarê AKP'ê dan destê nijadperestan. Erdogan teslimê itihatparêzan kirin. Him nijatdperest û him jî itihatparêz heya niha bi saya hêzên navneteweyî li ser piya man. Erdogan û AKP'ê jî hebûna nakokiya pergalê wekî dijberiya van hêzan ji raya giştî re pêşkêş kir. Lê yên ku dixwazin guherîna pergalê ya li Tirkiyeyê fêm bikin divê li ziyareta Erdogan ya Brîtanyayê binhêrin. İngiltere hîn di nav pergala serdest de xwediyê rola diyarker e. Her wiha yên ku darbeya 15'ê Tîrmehê organîzekirin û pişt re ev darbe li gor daxwaza AKP'ê vala derxistin, yên ku piştgirî dan OHAL'a Tirkiyeyê jî heman hêzên sereke ne. Derdê hêzên serdest yên cihanê ne demokrasî ye.

Di vê warê de ev guherîn derfetên şoreşê jî bi xwe re dikemilîne. Civak parastina statukoyê na, guhertinek demokratîk dixwaze. Yên ku piştgrî didin AKP'ê jî pirsgirêka wan bi statukoyê re heye. Lê belê ev daxwaza gel hate manîpulekirin ji mecreya xwe hate durxistin. Li Rojhilata Navîn jî gelek mînakên vê yekê hene. Bihara Ereba daxwaza gel ya şoreşger dida nîşan. Lê pergalê li ser van daxwaza diktatoriyan ava kir. Li Tirkiyeyê jî heman tişt pêk hat. Li gel her tiştî daxwaza gel ya guherînek demokratîk mayînde û qedîm e. Divê ku ji vê daxwazê re bi rê û rêbazên rast pêşengtî bê kirin. Ev derfeta herî mezin ya têkoşîna demokrasiyê ye. Her wiha yên ku guhertinek demokratîk dixwazin neçar in ku bi gelê kurd re hevkarî bikin. Kemalistan jî dît ku dijberiya kurdan sedema hemû bela û misûbetan e. AKP jî dê di demek kurt de bibîne ku dê dijberiya kurdan bibe felaketa wê ya herî mezin. Her wiha kurd bi tena sere xwe bimînin jî dê pergala xwe ya demokratîk ava bikin. Ji îro pê de hêviya hemû derdorên demokrasîxwaz jî têkoşîna gelê kurd e. Îro roj roja fikar û xofê nîne, roj roja vîn û cesaretê ye ku em bikaribin pêşeroja xwe ava bikin. Hêza me û baweriya me ji bo vê yekê mezin e.

# Şoreşa 19'ê Tîrmehê bingeha Sûriya Demokratîk e



Idrîs HENAN

Hevserokê Meclîsa Qanûnsaz li Kantona Efrînê Mihemed Seîd Yûsiv derbarê salvegera şeşemîn a Şoreşa 19 Tîrmehê de axivî û diyar kir ku lidarxistina Şoreşa 19'ê Tîrmehê hewceyeke gelan a dîrokî bû.

**TIŞTEK BI NAVÊ ŞOREŞA NÎN BÛ**

Hevserokê Meclîsa Qanûnsaz li Kantona Efrînê Mihemed Seîd Yûsiv di destpêka nirxandinên xwe de wiha got: "Destpêka 2011an kesên ku navê şoreşgeriyê li xwe kiribûn bê proje bûn. Projeya wan a esas desthilatdarî bû. Li ser van esasan hewldanekî van aliyan hebû ku Kurdan ji xwe re bikin amûr û di xizmeta ajandeyên derve de bi kar bînin.

Yûsiv wiha dewam kir: "Wê çaxê me digot tişta diqewime ne şoreş e. Ji ber ku ti berjewendiya gelan tê de nîne. Berovajî, tenê xizmeta berjewendiyên hêzên derve dike. Ji ber van helwestên me, ev aliyên navborî bi piştgiriya hêzên derve dijminahiya me kirin. Dixwestin projeya me ya demokratîk têk bibin û li ser wê bingehê êrîşî herêmên me kirin.

**ŞOREŞ NIRXÊN GELAN DIPARÊZE**

Yûsiv hewceya lidarxistian Şoreşa 19 Tîrmehê jî wiha rave kir: "Ji bo ku rê li ber destwerdanên derve, tund û tûjî û zihniyeta kole ku ajantiyê esas digire, bê girtin, Şoreşa 19'ê Tîrmehê li Rojavayê Kurdistanê û Bakurê Sûriyê pêk hat. Pîvana wê ya sereke rizgarkirina civakê, aramî, biratiya gelan û pêkve jiyîn bû. Şoreşa 19 Tîrmehê xwe dispêre felsefeya Netewa Demokratîk ku biratiya gelan, azadiya jinê.

Yûsiv derbarê encamên Şoreşê de ev tişt anî ziman: "Yekemîn encama Şoreşa 19' Tîrmehê bi beşdarbûna hemû pêkhateyan avakirina hêzên parastinê û Encumena Gel a Rojava bûn. Ev gavên han heta astekê rê li ber mudexeleya derve girtin û sazî û dezgehên gel jî parastin."

**ŞOREŞÊ PROJEYÊN DERVE PÛÇ KIRIN**

Yûsiv derbarê avakirina Rêveberiyên Xweser de ev tişt got: "Ji bo pêşxistina berxwedana gelan a li hemberî zilma desthilatdariyê û pûçkirina projeyên derve, Rêveberiyên Xweseriya Demokratîk bi sazî û dezgehên xwe li Koban, Cizîr û Efrînê dest bi xebatên rêxistinkirina civakê kirin. Hemû pêkhate bê ferq û cudahî di nava vê sîstema nû de cih girtin û erkên xwe pêk anîn. Bi Şoreşa 19 Tîrmehê re li şûna têgînên netewperest pir-rengî, azadî û demokrasî hatin rûnişkandin.

**EFRÎN ZÎRWEYA 19'Ê TÎRMEHÊ BÛ**

Yûsiv di berdewama nirxandinên xwe de behsa hewldanên têkbirin Şoreşa 19' Tîrmehê kir û got: "Ji bo vê projeya çareserker asteng bikin, hêzên derve bi serkêşiya dewleta faşîst a Tirkiyê êrîşî destkeftiyên gelan li Rojava û Bakurê Sûriyê kirin. Bê navber di nav hewldana têkbirina projeya Netewa Demokratîk de bûn. Efrîn jî lûtkeya van êrîşan bû. Lê di heman demê de li hemberî van êrîşan bi ruhê Şoreşa 19'ê Tîrmehê li her derê berxwedaniyek bê hempa hat meşandin. Di encamê de herêmên Bakur Rojhilatê Sûriyê ku paytexta çeteyên DAIŞ Reqa di nav de ye hatin rizgarkirin. Li Kobanê derbeya mirinê xwarin. Efrîn jî zîrweya vê berxwedanê bû".

**RÊVEBERIYÊN DEMOKRATÎK**

Yûsiv bal kişand li ser wateya Şoreşa 19 Tîrmehê û got: "Şoreşa 19 Tîrmehê israra gelan a pêkve jiyînê ye. Di vê terzê jiyanê ku Şoreşa 19 Tîrmehê afirandiye de, çareseriya xweser ji hemû pirsgirêkan re pêşketiye. Li hemberî zihniyeta moderníteya kapîtalîst a avakirina Rojhilata Navîn a mezin, Şoreşa 19 Tîrmehê bi hişmendiya Netewa Demokratîk serkêşiya avakirina Rojhilata Navîn a nû armanc digirie..

**BI RUHÊ 19 TÎRMEHÊ WÊ AXA SÛRIYÊ BÊ RIZGARKIRIN**

Dawiyê de Hevserokê Meclîsa Qanûnsaz li kantona Efrînê Mihemed Seîd Yûsiv ev tiş anî zimant: "Çawa ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê hemû gelên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê rizgar kir, wê bi ruhê cangoriyên 19' Tîrmehê Efrîn û hemû axa Sûriyê ji dagirkeriyê bên rizgarkirin. Prensîb û rêgezên Şoreşa 19 Tîrmehê bi ideolojiya Netewa Demokratîk wê ji bo avakirina Sûriyeke demokratîk, pir-rengî û nenavendî bibin bingeh.


# Qendîl çiyayê hemû kurdan e

Serokê OSP'ê Sînan Çiftyurek, daxuyaniya Serokê Rêveberiya Başûrê Kurdistanê Neçirvan Barzanî a derbarê Qendîlê de rexne kir û got: "Divê kurdên Başûr û kurdên li Tirkiyê li dijî vê yekê helwesta xwe nişan bidin. Çawa ku Efrîn û Şengal ya hemû kurdan e, Qendîl jî çiyayê hemû kurdan e."

Têkildarî helwesta Rêveberên Başûrê Kurdistanê, Serokê Giştî yê Partiya Azadî û Sosyalizmê (OSP) Sînan Çîftyurek bertekên xwe anîn ziman. Çiftyurek, xwest hemû partiyên kurdan li dijî êrîşên li dijî kurdan bibin yek û wiha got: "Koma Heşdi Şebî u Artêşa Iraqê êrîşi Kerkukê kirin. Divê hemû partiyên kurdan li dijî êrîşan bibin yek. Dive yekîtiya xwe ava bikin. Divê demokrasiya nava xwe xurt bikin. Divê meclîs çalak tev bigere û pirsgirekên aborî bi awayekî eşkere bi gel re bê parvekirin. Yekitiya Netewî ya Kurd girîng e. Divê partiyên kurdan li dijî dagirkirina Kerkuk, Efrîn û herêmên din yên kurdan bibin yek û yekîtiya neteweyî xurt bikin. Tirkiye, Iraq, Îran û Sûriye li djî kurdan dibin yek. Divê kurd jî di nava xwe de bibin yek."

**QENDÎL ÇIYAYÊ HEMÛ KURDAN E**

Çîftyurek, anî ziman ku Tirkiye piştî operasyona li dijî Efrîn niha dixwaze li dijî Qendilê operasyonê pêk bine û wiha bi dawî kir: "Divê hemû partiyên kurdan li dijî polîtîkayên Tirkiyê dengê xwe bilind bikin. Daxuyaniyên Neçirvan Barzanî yên derbarê Qendîlê de nayê qebûlkirin. Hatina Barzanî ya Tirkiyê ne pirsgirêk in. Divê li Başûr û li Bakur siyaseta kurd li dijî van polîtîkayan helwesta neteweyî nîşan bide. Ger ku Kerkuk û Efrîn axa kurdan a hepar be Qendîl jî Çiyayê hemû kurdan e."





# Şoreşa Rojava bû çavkaniya azadiya jinan

***Fermandariya Giştî ya YPJ'ê bi wesîleya salvegera Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmeh'ê daxuyanî da û destnîşan kir ku şoreşa wan bûye çavkaniya azadiya hemû jinan. YPJ'ê wiha got, "Têkoşîna jinên Kurd bêguman xwedî kevneşopiyeke dîrokî ye. Jinan bi şoreşê re ne tenê ji aliyê leşkerî ve, di hemû aliyan de li hemû qadên jiyanê hêza xwe nîşanî tevahiya cîhanê dane. Ji ber vê yekê Şoreşa Rojava şoreşa jinê ye."***

Fermandariya Giştî ya YPJ'ê bi wesîleya salvegera Şoreşa Rojava ya 19'ê Tîrmeha 2012'an daxuyaniyeke nivîskî weşand û destnîşan kir ku şoreşa wan bûye çavkaniya .azadiya hemû jinan

Fermandariya Giştî ya Yekîneyên Parastina Jinê (YPJ) destnîşan kir .ku Şoreşa Rojava şoreşa jinê ye

Di daxuyaniya fermandariyê de hate gotin, "Şoreşa vejîna gelan û jinan a 19'ê Tîrmehê di serî de li Rêber APO, gelên Rojhilata Navîn, mirovahî û gelên Bakurê Sûriyê, tevahî şehîdên şoreşa azadiyê, şehîdên berxwedana serdemê, pîroz ".dikin

Fermandariya YPJ'ê diyar kir ku Şoreşa Rojava bi pêşengiya jinê dest pê kiriye û roj bi roj mezin bûye û wiha dewam kir: "Têkoşîna jinên Kurd bêguman xwedî kevneşopiyeke dîrokî ye. Têkoşîna jinên Kurd ku bi Besê, Zarîfe, Bêrîvan û Sarayan dest pê kir, bi Nalîn, Şervîn, Rêvan û Avestayan dewam ".kir

Di dewama daxuyaniyê de hate ragihandin ku Şoreşa Rojava bi beşdariya gel û jinên Kurd, Ereb, Suryanî, Tirkmen, jin û gelên ji baweriyên din mezintir bûye û ji bo hemû jinên cîhanê re bûye çavkani- .ya azadiyê

Fermandariya YPJ'ê destnîşan kir ku jinan bi şoreşê re ne tenê ji aliyê leşkerî ve, ji aliyê siyasî, îdeolojîk û felsefî ve li hemû qadên jiyanê bi îradeya xwe ya azad cih digirin û hêza xwe nîşanî tevahiya cîhanê dane. Fermandariyê got, "Ji ber vê ".yekê Şoreşa Rojava şoreşa jinê ye

# Li Efrînê yek ziman, yek mezheb tê ferzkirin



Civata gelên gef li wan tê xwarin (GfbV) ku saziyeke civakî ya navneteweyî ya li Elmanyayê ye, diyar kir ku dewleta Tirk li Efrînê li dijî Kurdan û komên din ên olî şer dike. Saziyê destnîşan kir ku yek ziman û yek mezheb li ser gelê herêmê tê ferzkirin.

Civata gelên gef li wan tê xwarin (GfbV) ku navenda wê li bajarê Gottîngen ê Elmanyayê ye, rapora xwe ya li ser Kantona Efrînê ku 4 meh in ji aliyê leşker û çeteyên Tirk ve hatiye dagirkirin, weşand. Rapor ji aliyê Berpirsyarê Maseya Rojhilata Navîn a Saziyê Dr. Kemal Sîdo ve hate eşkerekirin û işaret bi hewldanên dewleta Tirk ên ji bo tinekirina xemla dîrokî ya Efrînê hate kirin.

Di raporê de hate ragihandin, dewlet û çeteyên Tirk piştî ku 18'ê Adara 2018'an navenda Efrînê dagir kirin, yekser tabelayên bi Kurdî û dersên Kurdî yên li dibistanan rakirin û wiha hate gotin: "Li Efrînê ku gelek nasnameyên cuda yên etnîkî û olî bi hev re lê diman, piştre li jinan hate qedexekirin ku bi servekirî dernekevin derve. Li jinan hate ferzkirin ku xwe bi turbanê binixumînin. Ji nişka ve li kolanên Efrînê tenê mêrên bi rî xuya kirin.

**ÊZIDÎ, ELEWÎ Û XIRISTIYAN NÎNIN**

Saziya GfbV'ê bi bîr xist ku tevî Misilmanan li Efrînê Êzidî, Elewî û Xiristiyan jî hebûn û wiha dewam kir: "Êdî mirovên ji etnîk, ol û mezhebên cuda li bajêr nînin. Mînak; li gorî texmînên me beriya niha tenê li navenda bajarê Efrînê hezar Xiristiyan hebûn. Niha yekî bi tenê jî nîne."

Nûnerê GfbV'ê Dr. Sîdo li ser binpêkirina mafên mirovan a li Efrînê agahî da raya giştî: "Li gorî agahiyên ku me ji aktîvîstên li herêmê wergirtine, di nîvê destpêkê yê meha Tîrmehê de li Efrînê 120 kes hatin revandin, 7 kes hatin kuştin, 10 caran bûyerên şêlandinê û 27 caran jî serdegirtin çêbûn. Bêguman ev hejmar tenê yên têne dîtin e. Ji destpêka dagirkeriyê ya 18'ê Adarê û vir ve artêşa Tirk herî kêm 3 hezar Kurd revand. Di vê mijarê de hejmara ku tê texmînkirin derdora 7 hezarî ye.

**PAQIJIYA ETNÎKÎ**

Malbat ji tirsa, bûyerên revandinê eşkere nakin. Hêzên ser bi artêşa Tirk ve, timî dest datînin ser telefonên destan ên sivîlan. Bi kurtasî mirov dikarin bêjin ku li herêmê paqijkirine etnîkî tê kirin. Artêşa Tirk bi qasî deh hezar Îslamîstên tund ên ji derve aniye, li herêma Kurdan bi cih kiriye."

# Şoreşa Rojava guherînên mezin pêk anî

KCD'ê bi peyamekê 6'emîn salvegera Şoreşa Rojava pîroz kir û kesên di vê şoreşê de jiyana xwe ji dest dane bibîr .anî

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) bi boneya 6'emîn salvegera Şoreşa Rojava .peyamek nivîskî weşand

" :Peyama KCD'ê wiha ye

Em îsal jî 6'emîn salvegera Şoreşa Ro-" java bi moral, kelecan û coşeke mezin pîroz dikin. Şoreşa Rojava di serî de li gelê me û hemû gelên Rojhilata Navîn .û mirovahiyê pîroz be

Şoreşa Rojava a ku bi pêşengiya jinan pêş ket, di nava şeş salan de guherînên mezin ên şoreşî-civakî pêk anî û bi şahidiya mirovahiyê destanên mezin di nava rûplên dîrokê de nivîsand. Her geşedan û nirxên nû yên derxist holê û bi xwe re vîna mirovan, rêxistiniya wan .û hêza cewherî ya gelan derxist holê

Şoreşa Rojava li hemberî moderníteya kapîtalist û sîstema paşverû-dagirker a herêmî, ji hemû gelên Rojhilata Navîn re rêya azadî serfiraziyê vekiriye û bûye modela alternatîf. Şoreş sîstemek nû ya ji bo gelên Kurdistan û Rojhilata Navîn ava kiriye û ev sîstem bûye şewq û hêviya hemû gelan. Sîstema li ser bingeha nirxên demokratîk û civakî hatiye avakirin, li Sûriyeyeke demokratîk ji hemû gelan, bîr û baweriyan, çandan re bûye projeya jiyana bi hev re ya di nava aştî, wekhevî û biratiyê. Her wiha ev .sîstem bûye temînata azadiya gelan

Şoreşa Rojava bi Kurdistan û Sûriyê re li seranserê Rojhilata Navîn bûye modela avakar û pêla şoreşa nû ya azadî-demokratîk bi xwe re derxistiye holê. Hêzên dagirker û paşverû yên herêmî şoreşê wekî gefekê dîtine û çeteyên .DAIŞ'ê şandin ser vê şoreşê

Bi azadkirina Kobanê, Minbiç, Reqqa û bajarên din re di şexsê DAIŞ'ê de li hemberî sîstema dagirker a herêmî serkeftin bi dest xistiye. Ji ber vê yekê ne tenê ji bo gelê kurd di heman demê de ev şoreş bûye berxwedan û serkeftina hemû gelên herêmê û wijdanê hemû .mirovahiyê

Xwedîderketin, destek dayîn û jiyandina şoreşa Rojava tê wateya jiyandin û xwedîderketina daxwaz û têkoşîna azadî û demokrasiya gelên Rojhilata ".Navîn

# Ji ber mezinbûna şoreşê dijmin êrîşkar buye



Hevserokatiya Konseya Rêveber a KCK'ê salvegera 19'ê Tîrmehê Şoreşa Rojava pîroz kir. KCK'ê di peyama xwe de got, "Ji ber mezinbûna ".şoreşê dijmin êrîşkar bûye

Têkildarî salvegera 6'emîn a Şoreşa Rojava Hevserokiya Konseya Rêveber a KCK'ê daxuyaniyeke nivîskî weşand. KCK'ê diyar kir ku li Rojava hemû gel bi azadî bi hev re .dijîn

Di daxuyaniya KCK'ê de ev tişt hate :diyarkirin

Di 19'ê Tîrmeha 2012'an de ji bo" gelên Kurdistan, Sûriye û Rojhilata Navîn serdemeke nû bi Şoreşa Roja- .va re hatiye destpêkirin

Rastiya gel û civakî ya ku Rêber Apo di 20 salan de ava kiriye, di havîna 2012'an de bûye şoreşa civakî. Şoreşa Rojava bi xeta xweseriya demokratîk û konfederalîzmê bûye modela azadî û demokrasiyê. Kantonên li Rojava û Federasyona Bakurê Sûriyê li dijî her cure êrîşan bi qehremanî li ber xwe daye.Bi bêrdêlên giran bûye garantiya jiyana .azad û demokratîk a gelên Sûriyê

Xeta azadiya jinê ya ya di Şoreşa Rojava de hemû cîhan xistiye nav heyecanê. Ji ber vê jî gelên cîhanê Şoreşa Rojava wekî şoreşa jinê pênase dikin. Bi Şoreşa Rojava re hatiye dîtin ku demokrasiya rastîn ew ê bi nirxên civakî yên Rojhilata Navîn pêk were. Ji niha û şûnde têkoşerên azadî û demokrasiyê yên li Rojhilata Navîn û cîhanê ew ê Şoreşa Rojava ji xwe re bikin mînak. Ev tişt gelekî zelal e ku, ji ber mezinbûna şoreşê dijmin êrîşkar bûye. Tê dîtin ku bi kûrbûna azadî û demokrasiyê re, divê berxwedan jî kûr û berfireh be. Şoreşa Rojava xwe her dem spartiye gel û hêza xwe ya navxweyî, ji niha şûnde jî wisa bidome ew ê şoreş bêtir ".serkeftî be

## Mirovahî li ser koka xwe aj dide



Mihemed ŞAHÎN

Îro salvegera 6 emîn a şoreja Rojava ye. Li navenda şûnwarê şoreşa Neolîtîkê, li ser kok û rehên mirovahiyê di 19'ê tîrmeha 2012'de tîrêjên Şoreşa Rojavayê bi şewqa xwe dilê mirovahiyê germ kir. Bê guman Şoreşa Rojava mudaxaleya xeta dîroka şaş e. Mudaxaleya çanda qirker a ku 5 hezar sale mirov bi mirov û xwezayê bi mirov dide qirkirin.

Piştî meşa mirovahyê ya ji newala Rîfê a ber bi Mezopotamyayê şaristaniya mirovahiyê digihîje qonaxeke nû. Mirovahî di hembêza kevaneka zêrîn de mezin dibe û pêş dikeve. Ji ber xweş xweza û dewlemendiya Kevaneka zêrîn pêşketinên ku di sedan salan de pêk nehatine di 20 hezar salî de pêk tên. Bi destpêka şoreşa Neolîtîkê ya Bz.12.000 salî vir ve, bi taybet di serdema zêrîn a Til-Xelefê de (BZ-6000 -4000) ev pêşketin gihîştin asta herî jor.

Rehên pêşketinên mirovahiyê yên civakî û yên zanistî hemû di vî kevanekê de weşarîn e. Ev reh ji kevanekê dest pê dikin û ber bi başûrê Mezopotamya û cîhanê ve belav dibin. Di kevaneka zêrînde navendeke herî girîng yek a ku serkêşiya mirovahiyê kiriye Serêkanî -Til-Xelef e. Heke navendên din her yek weke rehên mirovahiyê bin, çanda Til-Xelef weke qurmê mirovahiyê ye.

Destkeftiyên mirovahiyê yên Til-Xelef li başûrê Mezopotamyayê di bin navê Çanda El-Ubeyt de digihîjin qonaxeke nû. Li ser destkeftiyên çanda Til-Xelf û El-Ubeyt di bin pêşengiya hişmendiya mêr a desthilat parêz de çanda dewletê ya Sumeran afirî. Ji wê rojê virve ye mirovahî û xweza bi qirkirinê re rû bi rû ne. Di 5 hezar salê derbasbûyî de çi sosret û bobelat nemane ku bi serî mirovahiyê û xwezayê de nehatibin. Lewre Rêberê Gelê Kurd birêz Ocalan dibêje "dîrok ket xeteke şaş"

Gelek caran civakên Rojhilatanavîn dibin pêşengiya lêhengên weke Kawayê Hesinkar de hewldane dawî li vê çanda cinawir binin lê biser neketine. Gelek girîng û watedare ku piştî 5 hezar salî careke din li Serêkaniyê û di bin pêşengiya neviyên Kawayê Hesinkar de hewldanek pêşdikeve. Serêkaniyê ya ku di serdema Neolîtîkê de bi çanda xwe weke tîrêjên rojê dahatûya mirovahiyê ronî kiribû niha carek din hewl dide mirovahiyê ji tarîtiya dojehê ya çanda qirker rizgar bik e. Navê wê hewldanê Şoreşa Rojava ye.

Nirx û rûmetên mirovahiyê bi Şoreşa Rojava li Serêkaniyê, li ser çanda Til-Xelef aj didin. Şoreşa Rojava li çanda xweşbîn a mirov bi mirov re aşt, mirov bi xwezayê re aşt xwedî derdikeve. Li nirx û rûmtên mirovahiyên ku di destê çanda qirker de hatine eciqandin xwedî derdikeve.

Neviyên çanda Til-Xelef, Kurd, Asûr, Suryan, Ereb, Ermen, Keldan û hwd. mil dane hevûdu û dibêjin emê bi rengê xwe, bi dengê xwe di nav aştî û aramî de bihevre bijîn. Piştî sedan salan cara yekemîne ev civak di derbarê jiyana xwe de, di derbarê dahatûya xwe de ew bi xwe biryarê didin.

Bê guman civakên Rojhilatanavîn ji vê çanda demokratîk a bi rûmet re ne biyanî ne. Konfedarasyona Med'an, Konfederasyona Mîtaniyan ku paytexta wê Serêkanî bi xwe ye mînakên herî girîngin. Lewre li dijber çanda qirker careke din ji Serêkaniyê bilindbûna dengê mirovahiyê ne tesedufe.

Çewa ku her jîndar li ser kok û rehên xwe hêşîn dibin, nirx û rûmetên mirovahiyê jî li ser kok û rehên xwe aj didin. Hêz dayin, xwedî derketin û mezinkirina ajdanan pêwir û erka dîrokiye. Serkeftina Şoreşa Rojava mizgîniya rizgariya mirovahiyê ye.

Şoreşa Rojava li neviyên Çanda Til-Xelef û hemû mirovahiyê pîroz be.